

SERKEFTIN

www.tevgerakomunist.com

Hejmar: 17

Dîrok: Tebax 2025

Biha: 1000

DENGÊ ŞOREŞ Û AZADIYÊ

xwe birêxistin bike xwe biparêze



2 NERÎN:

Bijî Vîna Gel a Yekbûyî

3 JIN:

Hemû mêrên bindest di nav refên
şoreşa jinê da cih bigirin!

4 ROJEV:

Ji bo parastina şoreş û pêşeroja
xwe xweparastin

6 CIWAN:

Nirxandina Hemleya Salvegera
10emîn a Pirsûsê



Bijî Vina Gel a Yekbûyî

Em hevrê Nûrettîn Sofî û Koçero Urfa ên ku ji bo azadiya gelê Kurd û gelên herêmê şer kirin û di encama êrîşên dewleta Tirk a mêtîngehkar da şehîd ketin, bi hezkirin û rêzdarî bi bir finin.

Hevrê Nûrettîn Sofî û Koçero Urfa, di avakirina civakî û parastina leşkerî ya şoreşa Rojava da roleka pêşeng listin. Ji bo avakirina şoreşa yekbûyî ya gelan, kedeka mezin dan. Û ew ê di dilê şoreşa Rojava da bijîn.

Şoreşa Rojava, bi qehremanî, fedakarî û têkoşînên mezin hat avakirin. Di qonaxeka diyarkirî da, ne tenê ji bo Kurdistan, lê ji bo hemû gelên bindest ên herêmê bû hêvî. Îtifaqa demokratîk a ku di navbera gelên Kurd û Ereba da hat avakirin, destkeftiya herî stratejîk a şoreşa Rojava bû. Bêguman, Suryanî, Asûrî, Êzîdî, Ermenî, Dûrzî, Tirkmen, Çerkez, Elewî, Misilman û Xiristîyan ji di vê îtifaqê da cih girtin. Ji bo gelên ku ji hev hatibûn qutkirin, biyanîkirin û dijmin kirin, ezmûnêka pir bi qîmet a jiyana wekhev û azad a bi hev ra hat pêkanin. Guherîna vê rasfîya berbiçav a ku kapîtalîzmê perçe kiribû û emperyalîzmê serdesfî li ser ava kiribû, di heman demê da roleka dîrokî ya hêz û îradeya gelên yekbûyî careka din derxist holê. Rojhilata Navîn, di nav hamleyên di navbera blokên emperyalîst ên ku DYE û Çîn serkêşîya wan dikin, roleka girîng dilîze. Û rola vê îtifaqa gelan a ku li navenda herêmê, li Sûriyê û Rojava, hatîye avakirin, di vê pêvajoyê da gelekî girîng e.

Konferansa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî ya ku di dawîya meha Gulanê da, li Qamişlo pêk hat, gaveka dîrokî bû. Di destpêka meha Tebaxê da, li Heskê bi dirûşma "Ji bo cihêrengîya ku yekîtiya me xurt dike û hevkarîya ku siberoja me ava dike, bi hev ra" û bi beşdarîya 500 nûneran, Konferansa Helwesta Hevpar a Pêkhatayên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hate lidarxistin. Ev konferans, ji aliyê diyarkirina îradeya yekbûyî ya gelan û bawerîyan ve, daxuyanîyeka nû ya vîne ye.

Yekjiarmancênbingehîndesthilatdarîya HTŞê û piştgirîwê dewleta Tirk a mêtîngehkar, têkbirina îtifaqa Kurd û Ereba e. Têkbirina vê îtifaqê tê wateya ku bajarên Dêrazor, Reqqa û Tebqa bikevin bin rêveberîya HTŞê, û her wiha Rêveberîya Xweser ji başûr ve ji aliyê cîhadîstên HTŞê û ji bakur ve ji aliyê dewleta Tirk a mêtîngehkar ve were dorpêçkirin û fetisandin. Serokê HTŞê El Colanî, ku behsa avakirina Komareka Erebi dike, nikarî gelê Ereba bi vê qayîl bike. Di mehên Çile û Sibate da, di navbera hin eşîran da lerizîn çêbû, bi

provokasyonên li Reqayê hewl hate dayîn ku gelê Ereba li dijî Rêveberîya Xweser serî hilde. Lê encam nehat bidestxistin.

Helwesta emperyalîst û vîna şoreşgerî ya gelan

Du stûnên emperyalîzma DYE yên li Rojhilata Navîn hene. Yek Îsraîl e, ya din jî Tirkîye ye. Li Sûriyê leqayî hev hatina van her du dewletan, encama hevberîkirina stratejîyên wan ên berfirehbûnê û tîrsa wan a ji parçebûnê ye. Her du jî bi hişyarî tevdigerin. Lê belê, tengezarîya sîyasî û leşkerî zêde dibe. Lê ev tengezarî wê negihêje asta ku ew çekên xwe li hember hev bilind bikin.

Dewleta Îsraîlê, mîna ku Hîtler li Stalingradê kiribû, stratejîya bi birçibûnê teslîmgirtina gel dimeşîne. Erdoğana faşîst, qaşo li dijî taktîka tunekirina Filistinê û bêmirovkirina Xezayê bertek nîşan dide. Lê bazirganîya bi Îsraîlê ra didomîne. Destûrê dide kêşîyên ku ji Deryaya Spî çek û lojîstîkê ji Îsraîlê ra dibin. Yanî berteka wî tenê bi gotinê ye. Ne xwedî hêzeka astengker e. Jixwe niyeteka wî ya wisa jî tune. Ji bilî manipulekirina wîdana gelan tu naveroka gotinê "bêwîcdanîyê" jî tune.

Sîyaseta DYEê ya li Sûriyê, bi taybetî di têkîlîya di navbera Şam û Rêveberîya Xweser da, li ser domdarîya dewleta Tirk û El Colanî hatîye avakirin. Dewleta dagirker a Tirk, Rêveberîya Xweser ji aliyê hebûn û xwezaya xwe ya dagirker ve wekî metirsîyeka mezin dibîne. Ji ber vê yekê, tasfîyekirina xisleta îdeolojîk, sîyasî û leşkerî ya Rojava û ketina wê di bin sîwana hikûmeta Şamê da ferz dike. Israra Rêveberîya Xweser a li ser Sûriyeka demokratîk û nenavendî, bi gefên şer û dagirkirina dewleta Tirk ra rû bi rû dimîne. Tiştê ku dewleta Tirk jê ra "pêvajo" ya îtifaqa Tirk-Kurd-Ereba dibêje, teslîmgirtina Kurdistan e. Dema em li dîroka dewleta Tirk dinêrin, em vê yekê dibînin.

Pêvajoya avakirina dewleta Tirk, di heman demê da pêvajoya komkujîyên li ser gelan e. Ermenî hatin qetilkirin û ji cihên xwe hatin derxistin. Kurd di komkujîyan ra hatin derbaskirin. Elewî hatin qetilkirin. Bi komkujîya Seyfo, Suryanî hatin qelandin. Rûm jî cihên xwe hatin derxistin û malên wan hatin desteserkin. Dewleta Tirk li ser vê wêranîyê hat avakirin. Dewleta Tirk, di pêvajoya damezrandina xwe da, behsa îtifaqa Tirk-Kurd kiribû û di Destûra 1921an da hebûna Kurdistan nas kiribû. Lê di pêvajoya avakirina da, dema ku qonaxên krîtik ên wekî Peymana

Lozanê hatin derbaskirin, îtifaqa bi Kurdistan ra têk bir û dest bi komkujîyan kir.

Niha jî heman tiştî HTŞ dike. Ew dixwaze îradeyên cuda yên gel û bawerîyan ên ku li dijî wê disekin tasfîye bike. Komkujîya li ser Elewîyan, bûyerên li Sûweydayê mînakên vê yekê yên rojane ne.

Dem a DAÎŞê ji bo avakirina dewletê ji Iraqê ber bi Şamê ve meşîya, wê jî heman tişt kiribû. Bi qetilkirina gelan hewl dabû rêya xwe veke. Ger li Kobanê nehatiba rawestandî, bi taybetî Kurd û hemû gelên herêmê dê ji tiştên ku îro Elewî û Dûrzî dijîn, qetlîmên bihêztir bijîyana. Yanî xisleta HTŞê xisleta DAÎŞê ye. DAÎŞê ku duh nekaribû bibê dewlet, îro bi piştgirîya emperyalîstan, Tirkîye, Erebestana Siûdî û Qeterê tê dewletkirin. Koalîsyona ku qaşo li dijî DAÎŞê hatibû damezrandî, îro li kêleka DAÎŞa bi kravata disekine. Dîyar e ku derdê emperyalîstan ne cîhadîstên DAÎŞ, HTŞ an El Qaîde ye. Ji bo wan tenê berjewendîyên wan ên emperyalîst girîng in.

Dostê yekane û hevalê rêya dirêj ê şoreşa me ya Rojava, Rêveberîya Xweser a Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, gelên bindest û şoreşgerên herêmê ne. Dema em tam bi vê rasfîyê, li Konferansa Helwesta Hevpar dinêrin, girîngîya wê ya jîyanî ji bo hebûn û yekîtiya demokratîk a gelan tê dîtin.

Peyamên hemû pêkhatayên Konferansa Helwesta Hevpar, lê bi taybetî yên şêxên Elewî û Dûrzî, girîng in. Hebûna QSDê û nêzîkatîya parastina bêdudilî ya xweparastinê, di heman demê da dersa mezin e ku ji ezmûnek berbiçav hatîye derxistin. Ger dewleta Tirk a mêtîngehkar û çeteyên wê li Tişrînê nehatibana rawestandî, îro wê şerek û dagirkirinek mezintir bihatiba jîyîn. Gelekî çekdar û artêşbûyî, rê neda êrîşên dagirker, axa Rêveberîya Xweser û gelê wê parast. Zêdekirina hêza artêşa gel, bilindkirina asta wê ya teknîkî, xurtkirina rêxistinbûna gel, di komun û meclîsan da bilindkirina asta kirdebûna gel, erkê herî lezgîn ê îro ye. Dîrok û pêşketinên rojane ji me ra nîşan didin ku gelekî bê xweparastin, ne li ser maseyê ne jî li qadê nabe xwedî hêz.

Ji bo rêxistinbûn, mezinkirina xweparastina me, û têkoşîna ji bo jîyaneka wekhev û azad, welatparêzên sosyalîst divê vê serdemê wekî seferberîyeka rêxistinbûnê ya tam bigirin dest. Divê ji bo şerên nû amade bin. Biryardarîya îdeolojîk, girêdana bi şoreşê ra û bawerîya bi gel, erkên herî girîng ên vê pêvajoyê ne.

Li dijî HTŞê ya ku bi jinan ra hemû civakê dike kole hemû mêrên bindest di nav refên şoreşa jinê da cih bigirin

Di destpêka dîroka mirovahîyê da, bi keda bi hezaran salan a jinan, yekem civakbûn pêş ket. Hilberîn, parvekirin, rêveberî û mezinkirina zarokan, li gorî hewcedariyên tevahiya civakê, bi pêşengîya jinan bi awayekî komûnal dihat kirin. Di vê serdemê da, ku wekî yekem civaka komûnal tê pênasekirin, ji bo hemû endamên civakê wekhevî, azadî û dadmendî hebû.

Bi pêşengîya jinan, yekem jiyana niştecîh, gund hatin avakirin. Di vê pêvajoyê da mêran zêdetir dest bi karanîna amûrên çandinîyê kirin. Pêşketinên di çandinîyê da bûn sedem ku civak ji ya ku dikare bixwe zêdetir hilberîne. Ev hilberîna zêde, bi demê ra di destê hin mêran da bû milkê taybet. Piştî vê yekê, pergala komûnal hêdî hêdî bi kok guherî û pergala milkê taybet a bi serwerîya mêran derket holê.

Ji bo mêran, milkê taybet bû her tişt. Mêr li hember milkê taybet bû haybêrek. Milkê taybet dest bi rêvebirina wî kir. Xwesteka bidestxistina zêdetir milk, bû navenda jiyana wî. Ji bo ku milkê xwe ji zarokên xwe ra bi mîrat bihêle, pêşî jin wekî kole hat girtin, ji bo ku zarokên ku bavê wan dîyar e mezin bike. Yekem cudakarîya çînan di navbera jin û mêran da çêbû. Çînbûna yekem di navbera jin û zilam da çêbû. Piştî mêrên bê milk ji bûn kole. Bi vî awayî, ji mirovahîyê ra biyanîbûna mêran dest pê kir. Mêrên xwedî milk, ji bo parastin û pêşxistina berjewendiyên xwe, dewlet ava kirin. Artêş damezrandin, zindanan vekirin. Li ser mêrên bê milk û jinan, pergaleka bi zor û tundîyê avakirin.

Mêrên çîna bê milk ji di heman demê da koleyên çîna xwedî milk in. Çîna xwedî milk keda wan dixwe, zordariyê li wan dike; dema li hember vê derkevin ji tundî lê dikin, diavêjin zindanan û dikujin.

Ev mêrên kole, di heman demê da li hember jinan di rewşeka desthilatdar da ne. Ev rewşeka nakok e. Ji aliyekî ve

ew bindest in, zordarî û tundî dibînin; ji aliyekî din ve, ew bi xwe li ser keda jinê, laşê wê û zayendiya wê mijokdariyê dikin, zordarî û tundî lê dikin. Mêr bi vê rewşa xwe, bûne parêzvanên pergala kolefiyê. Karker û kedkarên mêr divê li dijî vê pergala milkê taybet, ku pergaleka zordarî, tundî û kedxwarîyê ye, têkoşînê bikin. Lê ji bo vê yekê, divê ew pêşî dev ji kedxwarî, zordarî û tundîya ku her roj li malê li hember jinan dubare dikin, berdin.

Di dîrokê da hemû pergalên civakî, kolefî, feodalîzm û kapîtalîzm, bi serwerîya mêran û milkê taybet bi hev ra hatin domandin û hevdu xurt kirin. Bi pergala kapîtalîst ra, jin tevî hilberîna civakî ya li derveyê malê bûn. Bingehê têkoşîna kolektîf a jinan a ji bo azadiyê xurt bû. Jinan, ji mafê dengdanê bigire heta mafê perwerdehiyê, ji mafê tenduristîyê bigire heta mafên herî biçûk, bi têkoşînê bi dest xistin.

Di kapîtalîzma qonaxa kûrewîbûna emperyalîst da, îro cudakarîya di navbera çînan û di navbera jin û mêran da gelekî zêde bûye. Dewlemendiya çîhanê, ji sedî 90ê wê di destê ji sedî yekê yê nifûsê da ye. Beşeka girîng a nifûsa 8 milyarî ya çîhanê bêkar e û bi birçîbûnê ra rû bi rû ye. Karker û kedkarên ku kar dibînin, bi mûçeyên kêr, demên dirêj ên xebatê û bêyî mafên civakî, di mercên kolefiyê da dixebitin.

Jinên karker û kedkar, ji aliyekî ve van mercên kolefiyê bi çend qatî dijîn, ji aliyekî din ve ji li hember êrişên berfireh ên mêrên takekesî û dewletên burjuvazî yê zilamperest, ku li dijî maf û azadiyên jinan şer dikin, dikeşin. Pêşî tê xwestin ku jin di nav sînorên kolefiyê da werin girtin. Di salên 1990î da, bi hilweşîna pergala revîzyonîst a Rûsyayê û kampanyayên reşkirinê yê burjuvazîyê, karker, kedkar, gelên bindest û mêtîngeh ji têkoşînên bi armanca sosyalîzmê dûr ketin. Bindestan dest bi lêgerînê nû kirin. Teverên faşîst û paşverû dest bi rêxistinbûnê kirin.

Di erdnîgarîya Îslamê da, rêxistinên cîhadî û bi serwerîya mêran ên faşîst ên cuda, di van şertan da bingehê rêxistinbûnê dîtin. El Qaîde, DAÎŞ, Boko Haram, Heyet El Tahrîr el Şam (HTŞ) û bi dehan rêxistinên wisa xwe avakirin. Dewletên emperyalîst û paşverû yê herêmê, ji bo berjewendiyên xwe, pir caran piştgirîya van tevgeran kirin. Yek ji van jî HTŞ ye. Ji aliyê DYE, Îngilîstan, Fransa, Erebiyana Siûdî, Tirkîye û Îsrailê ve demeka dirêj hat piştgirîkirin. Bi piştgirîya wan, rejîma Êsad hat hilweşandin û hikumeta Şamê radestî HTŞê kirin.

Çeteyên selefî û cîhadî yê HTŞê, piştî ku bûn desthilatdar, bi lez di rêya pêşxistina kapîtalîzmê da dimeşin. Bi piştgirîya dewletên emperyalîst û paşverû yê herêmê, dewleteka burjuvazî ava dikin. Lê belê, hikumeta nû ya Sûriyê ya di bin desthilatdariya HTŞê da, li ser gelên Sûriyê, bindest û jinan kolefiyeka tam ferz dike. Tam di vê xalê da, armanca dewletên emperyalîst û paşverû ya ku dixazin di serî da jinan û gelên Rojhilata Navîn bikin kole, bi vê yekê ra têkildar e.

Çeteyên HTŞê, gava ku li Sûriyê desthilatdariya xwe avakirin, destpêkê êrişî gelên Elewî û Dûrzî û jinan kirin û komkujî li wan kirin. Heman tişt li gel û jinên Xiristîyan kirin. Jin û zarok hatin revandin, rastî tecawizê hatin.

HTŞê, ji makezagona xwe bigire heta hikumeta xwe, ji helwesta wezîra jinê ya ku tayîn kirîye, dîyar kir ku ne tenê li hember jinên ji baweriyên cuda, lê li hember hemû jinan dixwaze wan di nav sînorên kolefiyê yê malê da bigire û serwerîya mêran xurt bike.

Yek ji sedemên ku dewletên emperyalîst û paşverû yê herêmê HTŞê li serê gelên Sûriyê kirin bela, ew e ku şoreşa demokratîk, gelparêz û azadîxwaza jinê ya li Bakur û Rojhilatê Sûriyê tasfiye bikin. Bi taybetî destkeftiyên jinan ji holê rakin.

Xurtkirina serwerîya mêran tê wateya xurtkirina pergala milkê taybet a kapîtalîzmê. Mêrên karker, kedkar û bindest, bi taybetî yê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û hemû Sûriyê, divê bizanibin ku her gavên ku ji bo kolekirina jinan tèn avêtin, tê wateya zêdetir kolekirina wan û zêdetir ji mirovahîyê biyanîbûna wan. Ji ber vê yekê, divê ew li hember her gavekî kolekirina jinan û tundîya li ser jinan têkoşînê bikin. Divê bi zanebûn li hember tasfiyekirina destkeftiyên şoreşa jinê rawestin û bi pratîkeka çalak berxwedanê nişan bidin.

Mêrên komunîst û şoreşger divê pêşengîyê bikin ku hemû mêrên karker, kedkar û bindest li hember çeteyên HTŞê di nav refên şoreşa jinê da rêxistin bikin. Divê vê têkoşînê bi têkoşîna xwe ya li dijî mêranîya civakî bikin yek. Tenê bi vî awayî em dikarin rê li ber kolekirina gelên Rojhilata Navîn ya ji aliyê dewletên kapîtalîst ên emperyalîst ve bigrin. Tenê bi vî awayî têkoşîna sosyalîzmê, ku rê li ber jîyaneka wekhev û azad vedike, dikare bê xurtkirin.



Ji bo parastina şoreş û pêşeroja xwe; xweparastin

Gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ev 13 sal in jîyanek di nav şer û wêranîyê da dijîn. Êşên gelekî mezin hatin jîyîn ku bi gotinê nayên vegotin. Cihên jîyanê hatin wêrankirin. Bi hezaran malbat, bi sed hezaran mirov ji vê zilmê bandor bûn.

Li pey pratîkên mêtîngehkar ên rejîma BAASê, êrîşên dagirkerîyê yê çeteyên îslamî yê polîtîk û dewleta Tirk hatin. Dewleta Tirk a mêtîngehkar li hember destkeftiyên gelê Kurd dest bi êrîşên qirkirinê û tunekirinê kir.

Ji bo gelan, di navbera êrîşkaran da ferqek zêde tunebû. Ji ber ku mêtîngehkar û çeteyên wan, armanc kirin ku hemû gelên ku hebûna wan qebûl nedikirin, tune bikin. Ji bo vê yekê, komkujîyên girseyî, serdegirtin, bombebaranên ji erd û asîman, revandin û îdamkirin û êrîşên dagirkerîyê yê rasterast pêk anîn. Di vê pêvajoya şer da bajar hatin rûxandin. Bi hezaran mirov jîyana xwe ji dest dan. Bi milyonan mirov ji qadên şer revîyan û mehkûmî jîyanek penaberîyê bûn.

Şoreşa Rojava ya ku gelê Kurd ji bo parastina axa xwe destpê kir, bi tevlêbûna gelên din ên herêmê ra bû destpêka jîyanek nû. Gelan bi destên hev girtin û pergala Rêveberîya Xweser ava kirin. Û jîyanek wekhev û azad, ku ew bixwe biryarên pêşeroja xwe bidin, ava kirin. Ev pergala ku li ser bingeha wekhevîya tam a gelan hatîye avakirin, ji bo hemû gelên Rojhilata Navîn ezmûnek girîng afirand. Şoreşa Rojava, ji hemû gelên herêmê ra nîşan da, ka azadî çawa dikare were bidestxistin.

Li giştî Sûriyê hîn şer xilas nebûye. Şerê navxweyî yê bi salan, ji bo gelên herêmê ezmûnek girîng jî derxist holê. Ji destpêka şoreşê heta îro, yek ji tiştên herî girîng ên ku qedera gelan diyar kirîye, rêxistinên xweparastinê bûn. Di nav vê kaos û polîtîkayên êrîşkar da, gelan bi qasî ku karîbûn xwe biparêzin, ew qasî karîbûn bi jîyanê ve girêdayî bimînin. Xweparastin, bi gotineka din, ji bo gelên me bû yek ji mercên jîyanê. Ger hişmendîya xweparastinê hebe û rêxistineka li gorî vê hişmendîyê hatibe avakirin, gelan karîbûn xwe biparêzin. Ger xweparastin tunebû, gel an rastî komkujîyên mezin

hatin an jî neçar man ku axa xwe biterikînin.

Ji ber ku hêzên emperyalîst û dewletên herêmî yê mêtîngehkar, hebûna gelan, mafên wan ên jîyanê û pêşeroja wan tune hesabandin. Ji bo wan, êş û zehmetiyên gelan qet ne girîng bûn. Tenê divîya bû ku tiştên diqewimin li gorî berjewendiyên wan bin. Ka li Şengalê, Kobanê, Tartusê an Swêydayê çend hezar mirov bêmal man, çend hezar mirov hatin kuştin, çend sed hezar mirov axa xwe terikandin, çend hezar jin hatin revandin û li bazarê hatin firotin, çend hezar mirov di gorên komî da hatin avêtin, an jî çend hezar mirov bi birçîbûn û mirinê ra rû bi rû man, ji bo wan qet ne girîng bû. Ew, wê qasê ji mirovatiya xwe derketibûn ku li ser maseyê biryar li ser navê gelan digirtin, sînor ji nû ve xêz dikirin û di navbera xwe da parve dikirin.

Gelên me, qedera xwe bi destê xwe girt. An mirineka nemirovane, an jî jîyaneka bi rûmet ku bi berxwedanê tê bidestxistin. Ji bo me, tu vebijarkeka din tunebû. Xweparastin şert bû. Xweparastin dihat wateya ji bo çek û hemû hewcedariyan rêxistinîkirina gel.

Di destpêkê da; divîyabû gel xwe birêxistin bike û bi şewazek artêşê cihên jîyana xwe biparêze. Ji bo parastina mafê jîyanê, rêyeka din tunebû. An dê te bikujin, an wê tu mal, ax û pêşeroja xwe biterikîni û biçî cihekî ku tu xerîb î. An jî dê tu ji bo azadîya jîyan û welatê xwe berxwedanê bikî. Dema ku dijmin ji bo te tune bike hat ser te, çek hilgirtin û afirandina berxwedaneka qehremanî vebijarka tenê bû.

Ger azadî bedelek bixwaze, divê tu amade bî wê bedelê bidî. Şerkirina ji bo hebûn û tunebûnê ev bû.

Ji bo vê yekê, di destpêkê da tabûrên gelên ji mirovên ji her temenî, hatin avakirin. Li derdora bajaran xendek hatin kolandin. Paşê yekîneyên leşkerî yê profesyonel tir hatin avakirin. Qadên perwerdeya leşkerî û akademî hatin damezrandin. Ciwanên jin û mêr, ji bo şer kirinê derketin pêş. Her ku gel bû artêş, jîyan li ser axa şoreşê ewletir bû. Bi tevlêbûna şer a jinan û avakirina rêxistinên xweparastinê yê jinan, artêşeka şoreşê ya ku dikare pêşeroja hemû gelên Rojhilata Navîn, bi taybetî ya jinan biguherîne, derket holê. Hêzên Sûriya Demokratîk, ku YPG û YPJ bingeha wê ya sereke ne, gihaşt hêzeka ku ne tenê gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, lê hemû gelên bindest ên Sûriyê dikarin rizgar bikin. Di bajaran da rêxistinên wekî Asayîş û HPC hatin avakirin û her wiha yekîneyên jinan ên van rêxistinên hatin damezrandin.

Ev hemû bi hewldana gel a mezinkirina xweparastinê ve girêdayî bûn. Di nav sînorên Bakur û Rojhilatê Sûriyê da her ku ewlehî hat misogerkirin, sazîyên girêdayî Rêveberîya Xweser jî bi lez, berhemdar û bi bandor rêbazeka xebatê ya birêkûpêk ava kirin. Şoreşê dest bi avêtina gavên ku wê di qada civakî da xurt bike, kir. Gelê ku xwedî hişmendîya xweparastinê ye, di heman demê da di gelek qadên wekî perwerde, hilberîn, tenduristî, piştgirîya gel û rêveberîya civakî da şewazeka kolektîf derxist holê. Gelên ku duh dagirkeran hewl dida wan bi

hev bide şandin, îro destên hev girtin û jîyaneka hevpar ava kirin. Û îro, ji bo gelên din ên ku li bajarên din ên Sûriyê di bin metirsiya komkujîyê da dijîn, bûn mînak.

Çeteyên HTŞê ên ku bi piştgirîya emperyalîstan ketin Şamê, hebûn û daxwazên gelên herêmê nepejirandin. Li herêma peravê, gelê Elewî yê bêçek rastî êrîşeka qirkirinê hat. Bi hezaran Elewî hatin kuştin, laşên wan ên bêcan li kêlekên rê hatin avêtin, hatin şewitandin. Emperyalîstan û dewletên dagirker, rêberê HTŞê Colanî bicesaret kirin. Wan jî bi lez li Sûweydayê dest bi êrîşeka qirkirinê ya nû li ser gelê me yê Dûrzî kir.

Lê belê, vê carê bi rastîya geleka rêxistinîkirî ra rû bi rû man. Gelê me yê Dûrzî axa xwe neterikand û bi bedela canê xwe li ber xwe da. Bi berxwedana xwe ya bi çek, gelê me yê Dûrzî ji tunebûnê xelas bû. Careka din nîşan da ku xweparastin ji bo gelên Rojhilata Navîn çiqas girîng e.

Ger gelek dikare xwe wekî artêşekê rêxistin bike, tenê wê demê dikare xwe û axa xwe biparêze. Ger hêzeka rêxistinîkirî û bi çek tune be, metirsiya komkujîyê heye. Yekane rêya parastina ji êrîşên ku dixwazî artêşa me ya şoreşê QSD û pergala me ya Rêveberîya Xweser tasfiye bikin, xurtkirina rêxistinên xweparastinê yê gelan e. Ji bo parastina azadîya xwe û bidestxistina wekhevîya tam a mafên gelan, divê em zêdetir xwe rêxistin bikin. Ji bo parastina şoreşa Rojava, divê em berxwedana gelê bi çek mezin bikin.

Berxwedan jîyan e!



Di nava kapîtalîzmê da dûrîtiya demokrasî û mirovahîyê

Têkoşîna gelan a li dijî zilmê, ya ji bo azadî û serxwebûna xwe, berdêl û qurbanî çibe ji dewam dike. Lê di encama peymanên dewletên empeyalîst yê cihanî da li Rojhilata Navîn hin gel hîna jî di bin dagirkerî û zilmê da dijîn.

Mîna gelê Kurd û gelê Filistînê. Têkoşîna van herdû gelan heta niha dewam dike. Tevî ku dewletên dagirker hewil dan, nasnameya wan ji holê rakin û wan tune bikin. Gelê Filistînî heta roja me ya îro rastî komkujîyan tê. Heta kengî dê makîneya şer ya îsraîlî ya li dijî gelê Filistînê li pêş çavên hemû cihanê dewam bike û komkujîyan pêk bîne,

Îsraîl bi makîneya şer li dijî gelê Filistînî sînardar nema ji ber ku armancên wê ne birin serî û dest bi dorpêçeka girankirî li dijî gelê Filistînê kir. Pêdiviyên jîyanî yê sereke; av, xwarin û derman li ser gelê Filistînê qut kir. Her wiha ji ber bombebaranên Îsraîlê fîmên bijîşkî nikarîbûn destwerdanê bikin û birîndaran derman bikin, armanc ji van kirîyaran ku îrade ya gel bişkîne û gel ji berxwedanê veqetîne.

Îsraîl ji dagirkerên kurdistanê ku li dijî gelê Kurd sînc û komkujîyên hovane pêk anîn ne dûr e. Li Bakurê Kurdistanê gel bi darê zorê koçber kirin û gund şewitandin û hîna jî li Rojhilat darvekirin li dijî gelê Kurd dewam dike. Li Başûrê Kurdistanê çekên

qedexekirî yê kîmîyawî hatin bikaranîn her wiha li Rojavayê kurdistanê jî kembera nijadperest ya erbî hat cîbicî kirin, demografîya herêmê guherandin û laşên bîyanî têde çandin.

Tiştê ku niha li Xezayê rû dide, di komkujîya ku li dijî gelê Filistînê da bi dehan mirov ji ber birçîbûnê jîyana xwe ji dest didin. Dema mirov dixwazin li cihên kombûyîne tenê ji bo ku sax bimînin ji bo xwe û malbatên xwe xwarinê bistînin dibin qurbanîya bombebaranên Îsraîlê.

Ma êdî nebesê ku wijdanê mirovahîyê şîyar bibe û li dijî êrîşên nijadperest yê Îsraîlê raweste. Îsraîl êrîşên xwe berfirh kirin û sînor derbas kirin. Êrîşên xwe li ser dewletên cîran berfireh kirin û bi hinceta parastina ewlehîya xwe, êrîşên xwe li ser hin welatên din jî dirêj kir.

Li gorî zagona parêzvanên demokrasîyê yê ku piştgirîyê didin desthilatdarîya xwînmêj ya Îsraîlê, welatên xerbê ev yekîne anî û ji bo armancên xwe yê pêşerojê li Rojhilata Navîn bi cih kir. Dema ku herêm hate dabeş kirin qurbana vê dabeşkirinê di serî da Kurdistan bû.

Qurbanîyên şerê Îsraîl li ser Xezayê gihiştin zêdetirî 60 hezar şehîdan. Bêhtirî xwe jin û zarok bûn. Hijmara kesên ku ji ber birçîbûnê jîyana xwe ji dest dan nêzî 200 kesî bêhtirî xwe zarokbûn. 150 hezar birîndar û yê mayî jî di bin konan da jîyana xwe bi zehmetî derbas dikin. Tiştê ku mirov matmayî dihêle dema berxwedêrek şehîd dibe wî wek terorîst binav dikin û Îsraîl bi xwe rojane komkujîyan pêk tîne. Parêzvanên mafên mirovan û demokrasîyê nikarin wê şermezar jî bikin, lê belê wê



şerîyetê didin Îsraîl ku ji mafê wê ye ku parastina xwe bike.

Îro Îsraîl li ser Dûrzîyên ku ji hêla hikûmeta veguhêz ya Sûrîyêya cîhadîst ve tîne tunekirin bi hincetên cûrbecûr û ji bo ku berjewendîyên xwe yê di Sûrîyê da pêk bîne diparêze.

Û ya ecêb ew e ku faşîzma Tirk xwe wekî parêzvanê misulmanan îlan dikê, li ser ragihandinê şerê Îsraîlê dike û dibêje mafê gelê Filistînê heye ku dewleteka wan li ser erdê hebe û bi awayekî dizî di hêla aborî û leşkerî da piştgirîyê dide Îsraîl û xwe ji birkirîye ku beşa herî mezin ji Kurdistanê dagir dike. Her wiha Îran xwe weke mertalek berxwedanê li dijî berfirehbûn û hêza Îsraîl dibîne û ew bû ya ku Sûrîyê sîyasî, leşkerî dagir dikir û destê wê bi rêjîma baasê re di kuştina gelê Sûrîyê da hebû.

Eşkere bûye ku Îsraîl ji bo ji nûve dabeşkirina cihanê û çavkanîyan amûra pêkanîna projeya emperyalîst a cihanî ye. Dewletên emperyalî naxwazin welatên herêmî yê wekî Îran û Tirkîyê têde rolekê bibînin. Ji ber vê ew piştgirîyê didin Îsraîlê û çavên xwe ji komkujîyên ku li dijî gelê Filistînê dike ra digrin.

Doza gelê Kurd û gelê Filistînî dibe asteng li pêşîya projeya dagirkerîya nû di nava şaristanîya kapîtalîzma ku hewil dide aloziyê çêbike da ku ji reşê sîd werbigre. Pêwîste gelê Filistîn û gelê Kurd ji bo ku aram li ser xaka xwe bijîn bibin yek.

Komûnîstên Rojavayî piştgirîya gelê Filistînê kirin

Endamên Tevgera Komûnîst a Şoreşger (TKŞ), êrîşên qirkirinê yê dewleta dagirker a Îsraîlê protesto kirin. Ji bo balê bikişînin ser mirinên ku ji ber birçîbûnê li Xezeya di bin ambargoyê da rû didin, li Kobanê grevek birçîbûnê ya rojekê li dar xistin.

Li avahîya sazîyê daxuyanîyek hate dayîn û ji nûnerên TKŞê Xanîm Îbrahîm axivî. Xanîm Îbrahîm dîyar kir ku emperyalîst û Îsraîla qirker bi xwe şer, mirin û birçîbûnê li gelên Rojhilata Navîn ferz dikin. Xanîm Îbrahîm got ku li Xezeyê ku av, derman û nan tune ye,

birçîbûn bûye gefa mirinê û wiha axivî:

"Ev zilm, bi destê Îsraîlê tê nîşandan û ev şerma dîrokî ya pergala kapîtalîst a emperyalîst e. Li Xezeyê mirovahî tê qetilkirin."

Xanîm Îbrahîm destnîşan kir ku ew ê li hember vê sîncê mirovahîyê bêdeng nemînin. Bang li hemû gelên bindest ên Rojhilata Navîn kir û wiha dewam kir: "Li dijî zulma li Xezeyê, em bi greva birçîbûnê piştgirîya xwe nîşan didin. Li dijî politikayên qirkirinê yê Îsraîlê û zordestîya emperyalîstan, em ê têkoşîne bilind bikin."

Ji bo Xezeyê û Rêwîyên Hanzala Azadî

Endamên TKŞ û JKŞê, êrîşa li dijî keştîya Hanzala ya ku ji bo Xezeyê alîkarîya xurekê dibir protesto kirin. Li Heskê li ber sazîyê daxuyanîyek hate dayîn û Endamê Meclîsa TKŞê ya Heskê Ehmed Xidir wiha axivî:

"Bi taybetî ji bo Filistîn û Kurdistanê, ji bo hemû gelên bindest ên Rojhilata Navîn, em wekhevî, edalet û azadî dixwazin. Îsraîlê ku bi salan şerê navxweyî yê Sûrîyê temaşe kir, ji bo parastina gelê

Dûrzî yê Sûweyda gef li hikûmeta Şamê xwar. Lê heman Îsraîl, li Xezeyê qirkirinek mezin û sîncê mirovahîyê dike. Êdî bes e. Divê gelê Xezeyê li ser axa xwe bi azadî bijî."

Ehmed Xidir bangewazî li hemû gelên Rojhilata Navîn kir û wiha axivî: "Gelê Dûrzî yê Sûweyda yê ku li dijî çeteyên HTŞ, DAÎŞ û El Qaîdeyê li ber xwe dide, careka din nîşan da ku rêya yekane berxwedan e. Dostê gelên bindest, tenê bindestên welatên din in. Divê gelên me li seranserê Rojhilata Navîn ji bo pêşerojeka azad berxwedanên xwe bikin yek."

Di dawîya daxuyanîyê da dirûşmên "Bijî Filistîna azad" û "Bijî Kurdistanê azad" hatin qîrîn.



Nirxandina Hemleya Salvegera 10emîn a Pirsûsê

10 sal... Ji bo tolhildana hevrêyan hîn zêdetir xurtkirina îradeya xwe. Her sal ku diçe em zêdetir bêriya hevrêyan xwe dikin. Û li gel van, li ser axa şoreşa Rojava têkoşînê didomînin. Ev hin ji wan berpîrsîyarîyan bûn ku beriya hemleyê li ser milên me, yên ku li Rojava xebatên ciwanan dimeşînin, hatibûn barkirin.

Di çaryeka yekem a sala 2025an da, dema ku şerê Tişrînê di astekê da sivik bû û gefên li ser Kobanê kêm bûn, me du armancên sîyasî yên bingehîn danîn ber xwe. A yekem; 1ê Gulanê bû. Ya duyem; Hemleya salvegera 10emîn a komkujîya Pirsûsê bû.

Me qada destwerdanê li du beşan dabeş kir: hundir û derve. Ya yekem, bi "kordînasyonên hamleyê" û bi "rêxistinên erkên taybet ên di nav hamleyê de" ji nû ve avakirina rêxistina me ya hundir bû. Ji derve jî, me xwest ku em xwe bigihîjin girseyên herî berfireh, şehîdên Pirsûsê ji wan ra vebêjin û wan vexwînin ji bo di nav refên ciwanên komunîst da rêxistin bibin.

Ji bo nêrînen me yên di derheqê pêşengîya hevrêyan me ya bi hemleya "Me Bi Hev ra Parast, Em ê Bi Hev ra Avabikin", di nav şoreşa Rojava da rola komunîstan, heta rola avaker a ciwanan ya di avakirina paşerojê da, di gelek mijaran da me di kovar, broşûr, daxuyanî û afîşan da ravekirin, ji bo vê yekê me komîsyonên amadekarîyê ava kirin.

Dirûşma hamleya me wekî "Di salvegera 10emîn da ala şehîdên Pirsûsê di destê ciwanan da bilind dibe" hat destnîşankirin. Me xwest ku mijara rêxistinbûna hundir û derve ya ku me destnîşan kiribû, tam di vê dirûşmê da xwe îfade bike. Komkujîya Pirsûsê êrîşeka li dijî tevgera ciwanên rêxistinkirî bû. Bi vê nêzîkatîyê, armanca me ya herî pêşîn ew bû ku her xebateka ku em bikin, bi wek al bilindkirina şehîdên Pirsûsê pêk bînin. Karê me yê yekem amadekirina belavokê bû. Me belavok bi şewaza pirsbersiv amade kir. 10 sal di ser komkujîyê ra derbas bûbûn, piraniya ciwanan an jibîr kiribûn an jî qet nebihîstibûn. Pirsûs me ya yekem "Pirsûs li ku ye?" bû û pirsûs dawî jî "Ji bo ciwanên Rojava çima girîng e ku li şehîdên Pirsûsê xwedî derkeve?" bû. Me ne tenê xwest ku daxuyanî bê belavkirin, me xwest ku di nav kesên ku daxuyanî werdigirin da pirsêk çêbibe û hişmendîyek bê rêxistinkirin. Daxuyanî bi du zimanan, bi Erebî û Kurdî hat amadekirin, li her cihê ku hate belavkirin,

me bi girseyan ra xwend û dest bi vegotina şehîdên Pirsûsê kir.

Li gel belavokê, me ji bo propagandayê broşûrek jî amade kir. Di vê nivîsê da me hemû şehîdên Pirsûsê yek bi yek rave kirin. Me hemleya SGDFê, pêşketinên beriya komkujîyê û rewşa şoreşa me bi hûrgilî şirove kir. Di salvegera 10emîn a komkujîyê da, me xwest ku bi belgeyeka dîrokî hevalên xwe ji ciwanên Rojavayê ra vebêjin. Û broşûr, di seranserê hamleyê da bû yek ji materyalên perwerdeyê yên bingehîn.

Plana giştî ya hamleyê, vegotina şehîdên me ji girseyên herî berfireh ra, bi awayekî têkildarî cih, kes û bûyerên dîrokî yên şoreşa Rojava, bi bîranîna 33 hevrêyan me yên şehîd 33 çalakî kirin bû.

Ji dêvla ku em hemû çalakîyan rêz bikin, çend mînakên bidin bes e. Me li navenda bajarê Reqayê, li çarxerêya Naîmî, ku DAÎŞê dadgeh ava kiribûn û bi komkujîyan tirs di nav gel da belav kiribû, daxuyanîyeka çapemenîyê da. Bi vê yekê ra, me xwest ku em vê yekê ji her kesî ra ragihînin: Li vir, li vî bajarî, li paytexta DAÎŞê ya ku tîk çû, em hevrêyan xwe bi bîr tînin. Û em ê bi hişmendîya tolgirtina hevrêyan xwe, ji Enqerê heta Reqayê, xwedî li bîranîna wan derkevin. Em dizanin ku bi taybetî gazîyên Pirsûsê, piştî komkujîyê di parastina şoreşê da, herî zêde xwestin di hemleya azadkirina Reqayê da cih bigirin. Ji bo tolgirtina Pirsûsê, di hemû komên êrîşê da di refên pêşîn da cih girtin. Û di azadkirina Reqayê da roleka girîng listin.

Çalakîyeka din; bîranîna zarokên ku di agirê sînemaya Amûdê da hatin qetilkirin bû. Ev komkujî, yek ji êşên herî kûr ên dîroka Rojavayê Kurdistanê bû. Di vê komkujîya plankirî ya ku ji aliyê Baas ve hatibû pejiwandin da, bi sedan zarok bi girtina derîyan zindî hatin şewitandin. Ev ne tenê tîkbirineka tirsê bû, êrîşeka tunekirinê ya tam bû. Girîngîya dîrokî ya ku ciwanên gelê Kurd, yên ku ji axên xwe ji nû ve zindî bûn, bi bilindkirina şehîdên Pirsûsê wekî ala xwe li Sînemaya Amûdê bîranîn çêkirin, gelekê mezin bû.

Di vê serdemê da, hamleya me bi çalakîyên curbicur û di astên cuda da berdewam kir. Xebata tevlêbûna bîranîna navendî, yek ji xebatên esasî bû. Di seranserê hamleyê da, li hemû bajaran bi giştî bi hezaran daxuyanî hatin belavkirin. Yek ji armancên me, gihîştina

taxên ku em qet neçûbûn an jî demeka dirêj xebat lê nehatibû kirin û avakirina tîkilîyên nû bû. Bi vê plansazîyê, me hem derdora xwe fireh kir û li qadên nû dest bi xebatê kir, hem jî xwest ku hevalên me yên ku di xebata ciwanan da pêşeng in, pêş bikevin û tecrubeya hamleyê bi dest bixin.

Ji Kobanê heta Qamişloyê, "hamleya me ya Pirsûsê" ket rojeva hemû sazîyan. Ji navendên çandî heta fermandarîyên eyaletan, bi xwedîderketina gelek sazîyên cuda li hamleya me, me pêvajoyek rêxistin kir. Ev di heman demê da encama nêzîkatîya "Şehîdên Pirsûsê şehîdên şoreşa Rojava ne û xwedîderketin erka me hemûyan e" bû.

Bi heman nêzîkatîyê, me kovara xwe wekî hejmareka taybet a Pirsûsê derxist, belavkirina wê veguherand kampanyayeka alîkarîyê. Û me tîkilîyên nû bi dest xistin. Ji ber ku hemû xebat li ser bingeha zêdekirina tîkilîyên nû li yên heyî hatibû avakirin.

Piştî bîranîna navendî ya 18ê Tîrmehê li Kobanê, di 20ê Tîrmehê da jî li hemû bajarên ku me xebat lê dimeşand, bîranînen cuda hatin lidarxistin û me hamleya xwe tamam kir.

Hema hema beriya hemû belavkirinan, me li ser naveroka belavokan û xebatên ajîtasyonê yên ku em ê bikin, civîn lidarxistin. Me ji bo tîkilîyên nû yên ku hatin bidestxistin û pirsgrêkên ku derketin holê civîn çêkirin. Ev yek gelekî alîkarî kir ku xebatên me bi awayekî rêxistinkirî bi pêş bikeve.

Di dawîya hamleyê da, me bi hemû hevrêyan kevn û nû yên ku beşdarî xebatan bûn ra civînek çêkir û nirxandineka giştî ya hamleyê pêk anî. Dema ku em paşve mêze dikin, ji ber sedemên cuda, ji ber kêmasî û kêmiyên me, gelek tiştên ku me nekarîye bikin hebûn. Û ev yek, ji bo xebatên me yên pêşerojê wekî tecrubeyek hat tomarkirin.

Di dawîya hamleyê da, fêhm dayîna; Polen, Cebo, Büşra û şehîdên din; ravekirina pêşengîya Roza, Dilşer, Sarîn û Ulaş, pêşve derketina hevrê Zilan a wek jineka ciwan a Rojavayî, fêhm dayîna van hemûyan bi hevrêyan nû ên ku beşdarî refên me bûn, û di jîyan û guhertinên wan da dîtina encamê van ji bo me pir girîng bû.

Deynê me ji şehîdên me ra xelas nabe. Êşên me jî haş nabin. Lê rûmeta di hesab pirsîna Şehîdên Pirsûsê da çend gav din jî were avêtin a ciwanên me yên Rojava ye.



Di roja me ya îro da ku hêzên emperyalîst û dîktatorîyên mêtîngehkar Rojhilata Navîn dîsa parvedikin da têkoşîna bindestan, divê li dijî emperyalîzmê, mêtîngehkarîyê û pergala kapîtalîst a desthilatdarîya mêran be. Di serdemeka ku nîşanên şerekî nû yê parvekirinê tê dîtin da pîrsgirêka neteweyî wekî serdemên destpêkê yê kapîtalîzmê nikare were bidestgirtin. Kapîtalîzma di qonaxa kûrewîbûna emperyalîst da, bi taybetî çîna karker û hemû beşên civakî û neteweyên bindest dixê bin kedxwarîyeka bê sînor. Ew, wan neçar dike ku bikevin nav çerxên kapîtalîzmê yê wêranker û gemarî. Li hember vê yekê tenê rêyeka vebijark heye: berxwedan û ji bo cîhaneka nû têkoşîn.

Kapîtalîst, dixwazin her tiştî bixin bin hegemonîya xwe. Têkoşîna bindestan a bi xisleta neteweyî, çînî, çandî, ekolojîk an zayendî, bêyî armanca wêrankirina wê nikare bi ser bikeve. Derfeta guhertina kapîtalîzmê bi reforman tune. Ev jî têkoşîna şoreşgerî ya ji bo sosyalîzmê ya li dijî kapîtalîzmê dike mecbûrî.

Rêya Rizgarîyê: Welatparêziya Sosyalîst

Welatparêziya sosyalîst; ji aliyê dîrokî, îdeolojîk û rojane ve, hem ji bo azadiya Kürdistanê di warê pîrsgirêka neteweyî da, hem jî ji aliyê çînî ve têkoşîna karker, kedkar û jinên Kurd ya li ser bingeha antifkapîtalîst û sosyalîst dike armanç.

Kapîtalîzm û îdeolojîya burjuvazîyê; qezenc, rant, kedxwarî, mêtîngehkarî, talan, wêrankerî û şer e. Di navenda hemû nakokîyên civakî da desthilatdarîya çînî radiweste. Her tiştê ku tê bîra mirov bi zordestîya kapîtalîzmê tê wêrankirin. Kapîtalîzm; li hember her tiştê ku li dijî qezenc û berjewendîyên wê ye, rûxandinê fîne.

Ev tê wateya ku karker û kedkarên komên neteweyî û neteweyên bindest bêhtir mehkûmê birçîbûn, kedxwarî û kolefîya kapîtalîst in. Azadiya gelên bindest, hem bi rizgarîya neteweyî hem jî bi ya civakî hewcehî dibîne. Karker û kedkarên neteweya bindest, daxwazên azadiyê divê bi têkoşîna rizgarîya çînî ra bikin yek.

Xeta têkoşîna welatparêziya sosyalîst; îdeolojîya têkoşîna rizgarîya neteweyî û civakî ya Kurdan e. Bêyî ku Marksîzm-Lenîzm bi têra xwe were têgihîştin, ne rizgarîya çînê ne jî ya neteweyên bindest pêkan e. Mînakê Başûrê Kürdistanê li ber çavên me ye. Malbata Barzanî ya hevkar û burjuvazî û derdora wê, Başûrê Kürdistanê bi awayekî dîktatorîyeka olîgarşik birêve dibe. Daxwazên karker û kedkarên Kurd ên ku mafên xwe diparêzin tene paşguhkirin. Qonaxa ku lêgerîna çareserîyê li ser bingeha burjuvazîyê gihîştîye ev e.

Komûnîst û Federasyona Demokratîk-Sosyalîst a Rojhilata Navîn

Li Rojhilata Navîn, federasyonên demokratîk an sosyalîst, ji bo komûnîstên Kürdistanê çareserîya herî rast a têkoşîna azadî û rizgarîya gelên herêmê vedibêje. Dîrokê heta niha gelek caran îspat kirîye ku hevkarîya bi çîna kedxwar ra (di roja me da bi burjuvazîyê ra) û dewletê ra tu



10ê Îlonê; Hemû Bindestan Vedixwîne Yekbûn û Têkoşînê

qezencê dernaxe holê. Karker û kedkarên neteweya bindest, di her têkoşîna ku ji bo berjewendîyên xwe yê çînî û neteweyî dane da, tevî kêmasîyên xwe, gelek serkeftin bi dest xistine.

Gelên Rojava-Bakur û Rojhilatê Sûriyê, li hember erka parastin û pêşxistina Rêveberîya Xweser a ku bi bedelên mezin hatîye bidestxistin in. Axê şoreşa Rojava, Rêveberîya Xweser û gelên herêmê di bin gefên êrişên dewleta Tirk a mêtîngehkar da ne. Şoreşa Rojava, tevî ku ne xwedî xisleteka sosyalîst e, emperyalîst û dîktatorîyên mêtîngehkar destkeftîyên neteweyî û demokratîk ên gelê Kurd qebûl nakin û hewl didin wê tasfîye bikin.

Têkoşîna gelê me yê Kurd û gelên herêmê yê ku ji bo jîyaneka wekhev û azad qedera xwe kirine yek ya li dijî dewletên mêtîngehkar, dagirker û emperyalîst xwedî girîngîyeka jîyanî ye. Em dikarin jîyana xwe, nîrxên xwe û mafên xwe yê neteweyî yê kolektîf tenê bi rêbazên şoreşgerî yê bi hêz biparêzin. Rêxistinkirina bi awayê gelê çekdar û xurtkirina xweparastinê; tê wateya zindîmayîne. Rizgarîya rastîn û azadî tenê bi ittîfaqa têkoşîna gelên bindest dikare were bidestxistin.

Yekbûna Têkoşîna Netewe û Bawerîyên Bindest Şert e

Dewleta Tirk a aşîst a mêtîngehkar, bi rêya HTŞê û çeteyên selefî yê DAIŞ û El Nusra, Rêveberîya me ya Xweser tehdît dike. Ew dixwazin destkeftîyên me ji holê rakin û şoreşa me bifetisînin. Emperyalîstên DYE û dewletên paşverû yê herêmê piştgirîya vê planê dikin. Ew piştgirîya HTŞ'yekê ku berjewendîyên wan diparêze û xizmeta wan dike, dikin. Ji ber vê yekê, li hember qirkirinên HTŞê yê li dijî Elewî, Dûrzî û gelên Xiristîyan, dagirkirina milkên gelên herêmê û talankirina wan bêdeng man. Li hember revandin, destavêtin û di bazarê da firotina jinan çavên xwe girtin.

Em wek; Kurd, Elewî, Druzî, Ermenî, Suryanî, Asûrî û hemû neteweyên din û bawerîyên herêmê, divê qedera xwe bi destên xwe bigirin. Divê em têkoşîna xwe mezin bikin, di heman refê da bibin yek û şer bikin. Ne emperyalîst ne jî dewletên Rojava ne dostên me ne, ne jî li me difikirin. Tenê têkoşîna me dikare derîyên

azadiya rastîn, rizgarîyê û cîhaneka bê çîn, bê îstîsmar û bê cudahiya zayendî ji me ra veke.

Komûnîst Şoreşa Rojava Diparêzin û Wê Biparêzin

10ê Îlonê, salvegera damezrandina pêşengîya komûnîst û destpêkirina têkoşîna ji bo rêberîya têkoşîna gelên bindest e. Partî, hemû neteweyên bindest û bawerîyan vedixwîne ji bo di bin ala sosyalîzmê da bibin yek û ji bo azadiya xwe têkoşînê mezin bikin.

Komûnîstên Rojavayî, ji bo parastina destkeftîyên şoreşa Rojava û Rêveberîya Xweser şer dikin. Ji bo ku şoreşa jinê têk neçe têkoşîna xwe mezin dikin. Jîyaneka ku azadî û wekhevîya gelên herêmê esas digire diparêzin. Ji bo vê armançê bi hemû hêza xwe û bi biryardarîyeka mezin têdikoşin. Em komûnîst, bawer dikin ku azadî û rizgarîya rastîn bi afirandina cîhaneka bê çîn pêkan e. Bêyî ku dawî li hebûna kapîtalîzmê û çîna kedxwar bê anîn, bêyî ku pergala milkîyeta taybet ji holê were rakirin, ne aşîfî, ne azadî, ne jî jîyaneka mirovane pêkan e.

Pergala kapîtalîst a ku keda me dixwe û komeka biçûk a burjuvazîya wî, dijminê me yê herî mezin e. Bêyî hilweşandina pergala wan em nikarin jîyaneka nû ava bikin. Rêya rizgarîya rastîn, ji bo avakirina sosyalîzmê rêxistinbûyîn, têkoşîn û şer e.

Komûnîstên Rojava, karker, kedkar, jin û ciwanên ji hemû netew û bawerîyên ku li axa Sûriyê dijîn, vedixwînin ku dawî li desthilatdarîya çeteyên selefî yê HTŞê yê ku ji aliyê emperyalîstan ve tene piştgirîkirin bînin, û ji bo avakirina desthilatdarîyeka şoreşger-demokratîk bibin yek.

Pêşeroja şoreşa jinê ya Rojava û Rêveberîya me ya Xweser, bi Sûriyeka şoreşgerî-demokratîk a ku yekîfîya wekhev, azad û dilxwaz a hemû gelan tê da tene avakirin pêkan e. Ji bo ku Kurd, Erebi, Dûrzî, Elewî, Xiristîyan û hemû gel nebin qurbanîyê qirkirineka nû; divê desthilatdarîya HTŞê ya li Şamê were hilweşandin.

Ji bo hemû beşên bindest, bidestxistina azadî û wekhevîya tam a mafan bi avakirina Sûriyeka demokratîk ve girêdayî ye. Komûnîst, ji bo vê yekê bi hemû hêza xwe têkoşîn dikin

Ji TKŞê bangewazîya piştgirîya bi Sûwêyda ra



KOBANÊ

Komûnîstên Rojavayî, êrîşên qetlîamê yên çeteyên HTŞê ku piştî Elewîyan li dijî gelê Dûrzî dest pê kirine şermezar kirin û banga piştgirîya bi gelê Sûwêyda ra kirin.

Di çalakîya ku li Kobanê li ber sazîyê hate lidarxistin da ji nûnerên TKŞê Xanim Îbrahîm axivî. Xanim Îbrahîm wiha got:

"Hêzên navneteweyî piştgirîyê didin çeteyên ku êrîşî gelan dikin. Îro çeteyê herî mezin El Colanî ye. Ew êrîşî gelan

dike. Li dijî gelê Elewî êrîşek qirkirinê pêk anî. Jin, zarok, kal û pîr, sivil hatin kuştin û qetlîamek hate kirin. Dewletan dengê xwe dernexistin, hemû cîhanê çavên xwe li vê qetlîamê girtin."

Xanim Îbrahîm ev bangewazî li gelên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê kir:

"Em jin û mêr rêxistinkirî ne. Em bindest amade ne. Bi her tiştê xwe amade ne. Divê gelê Kurd li dijî êrîşan yek be. Em ê tu carî destûr nedin ku çeteyên Colanî, qatîlên wî, gav bavêjin axa şoreşa Rojava. Me ev ax bi xwîna şehîdên xwe av da û em ê heta dawîyê biparêzin."

Ciwanên Komûnîst meşa dawî li Kobanê pêk anîn



KOBANÊ

